


Mistefa Hicrî

## Sipaha Pasdaran maddeyên hişber bona şikandina kesatiya takên civakê bi kar tîne

...» 3

## Pêşwaziya germ ya xelkê Kurdistanê moralek bihêz dida me

...» 8




Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# AGIRÎ

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (209) 06-07.2013 Buha (150) Tûmen


### 22'ê Pûşper û soza emegdariyê

Em hêdê hêdî bi vê roja herî nexweş a dîroka hevçerx ya Kurdan nêzîk dibin. Herçend me ew lîderê xwe yê herî hêja û jêhatî ji dest da, lê ew êdî ji bo Kurdan bûye mînaka xebat, şoreş, berxwedan û cangorîtiya ji bo xak û neteweya xwe. Lewra her kurdek divêt di vê rojê de erkê xwe di warê bîranîn û zindîragirtina nav û yad û bîra wî, bi her şêweyekê ku ji desta tê, bi cî bîne û bi vî awayî dujminan bê hêvî û alîgirên xebat Dr. Qasimlo jî kêfxweş û hêvîdar bike.



**Gelo Turkiye pirsa Kurd çareser dike yan a PKK** ...» 5




**Şêx Seîd Qehremanê Kurd** ...» 6




*Rojnameya Agirî di malpera www.kurdistanmadia.com de bixwînin.*

# Buhara Duyemîn a Erebî Morsî anî xwar





## Artêşa Misrê di daxuyaniyekê de Mihemed Morsî li ser kar avêt

Ebdulfetah Elsîsî Fermandeyê giştî ê hêzên çekdar ên Mîsrê, di daxuyaniyekê de helwêsta arteşê ragehand û eşkere kir ku Serokê dadgeha bilind a Yasaya Bingehîn Adil Mensûr, heya birêveçûna hilbijartin serkomariyê, vê birêveberiya welatê Mîsrê bigire stûyê xwe...

...» 2

www.arsivakurdi.org

Sergotar

# Morsî ket

Şehab Xalidî

Buhara Erebî ku rû li Mîsrê kiribû û dawî bi deshilata Husnî Mubarek anîbû, bibû sedema kêfxweşiya rejîma Komara Îslamiya Îranê û wan jî ew Şoreş wek hişyariya Îslamî bi nav dikirin û digotin ku ew yek doma Şoreşa Îslamiya Îranê ye.

Ew îdia û gotinên karbidestên rejîma Îranê her wê demê jî gellek bi dilê Misriyan nebû, û wan digot em dijî dîktatorekê xebatê dikin ku îzna hilmijîna hewayê azad nedaye me, û divêt Mîsr bibe welatek demokratîk û nûneratiya tewaya pêkhateyên wî welatî bike.

Ew bû ku şoreşa Misriyan serkevtin bi dest xist û piştî heyamekê hilbijartinek demokratîk pêk hat û li encam de Morsî deshilat bidestve girt.

Lê bidestvegirtina deshilatê ji aliyê Îxwanelmoslimînê ve ew jî ji riya hilbijartinek demokratîk aliyên sekolar êşandin, lê dîsan jî wan encama hilbijartinê demokratîk hesibandin.

Lê derbzbûna demê, nîşan da ku Morsî jî dixwaze bibe dîktatorek din û ew hemû xwîna ku ji bo azadiya Misriyan hatiye rijandin ji bîr bike û sitûnên deshilata xwe bihêz bike û yasayên nedemokratîk bi ser civaka vekirî û azad ya Mîsrê de bisepîne û di rastî de welatê xwe bike nawenda tundrewiya Îslamî.

Lê bi xweşî ve me dît ku xelkê hişyar û serwext ê Mîsrê bi xebat û tekoşîna xwe ya medenî îsbat kirin ku ew tu carî rê nadin ku welatê wan bibe bingeha deshilatdariya Îslama Siyasî û sepandina yasayên nedemokratîk, û ew biryara wan ya dîrokî cihê şanaziyê û hurmetgirtinê ye, û ew hêjayî azadî û demokrasiyê bi wateya tewaw ya peyvê ne.

Bi vê hêviyê ku toyê azadî û demokrasiyê li tewaya herêma me de bilav be û dawî bi dîktatoriya wîlayeta feqîh jî bê, û gelên Îranê jî bi azadî û demokrasiyê şa bin.



## Heyeteke NY serdana Deftera siyasî ya PDK Îranê kir

**Heyeta Rêxistina NY ku pêkhatibû ji "Sokol Kondî" Berpirsê Mekteba NY li Herêma Kurdistanê û herweha "Birayan Vîtoyînc" ser bi sekirtariyeta wê rêxistinê li Niyoyorkê û beşa karûbarên siyasî li Rojhelata Navîn û Başûrê Asiyayê, seredana Deftera Siyasî a PDK Îranê kirin û ji aliyê rêzdar Mistefa Hicrî ve hatin pêşwazîkirin.**

**Di vê civînê de hejmarek mijarên girîng weke rewşa siyasî ya Îranê, Rojhelata Navîn, Sûriye, Îraq, piroseya diyaloga PKK tevî dewleta Turkiyê, arîşeyên navbera rejîma Komara Îslamî û Rojava û herweha serkomariya Hesen Rûhanî hate kirin.**

**Her di civînê de heyeta NY opozisyona îranê, rola PDK Îranê, xebata neteweyên Îranê û rola Kongireya Neteweyên Îrana Federal bi giştî xist ber bas.**

**Rêzdar Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê jî, piştî pêşkêşkirina basek siyasî, bersiva tewahiya pirsiyarên heyeta mêhvan dan.**

## Birêz Mistefa Hicrî serdana nawenda Nêrgiz kir



Roja 5'ê Pûşperê rêzdar Mistefa Hicrî û hejmarek ji endamên Deftera Siyasî, serdana nûnerên hilbijartî ên gera duyemîn a hilbijartinên birêveberiya nawenda Nêrgiz kirin, û civînek bi wan re pêk anîn. Di kombûnê de nûnerên zarokên Nawenda 1, Nawenda 2, Nawenda 3, Kempa Şêrewen û Barîke beşdar bûn û xwastekên xwe bi birêz Hicrî ragehandin.

Sekreterê Gişî ê PDK Îranê jî, serbarê pîrozbahî ji endamên nû ên birêveberiya Nawenda Nêrgiz, piştevaniya PDKÎ ji wan xwastekan ragehand.

Roja 14'ê Cozerdana sala 1392'an, piroseya hibijartina Nawenda Nêrgiz bi amadebûna nûnerên Komisyona Siyasî Nizamî û Komisyona Çavdêriyê di heyamê du rojan de hat lidarxistin.

Hewceyî basê ye ku Nawenda Nêrgiz, Nawendek taybet bi zarok û nûciwanên Kurdistana Îranê ye ku li derveyî Kurdistana Îranê hatiye avakirin û take rêxistina di nava rêxistinên zarokên çar beşên Kurdistanê de ye ku endamên birêveberiya xwe ji rêya dengdanê ve hildibjêrin.

## Heyeta PDK Îranê sersaxî bo malbata Nadir Hewramî xwest

Şanda PDK Îranê bi serperestiya Rêzdar Mihemednezîf Qadirî Endamê Deftera Siyasî, peyama dilgiranî û sersaxiya PDK Îranê û Birêz Mistefa Hicrî Sekreterê giştî yê vê partiyê, bi berpirsên Partiya Demokrat û malbata Kurdperwer a Nadir Hewramî pêşmergeyê dêrîn û endamê serkirdatiya Partiya demokrat ragehand.

Şanda PDK Îranê ji aliyê endamên rêberiya Partiya Demokrat û Serbaz Hewramî kurê Nadir Hewramî ve hat pêşwazîkirin.






Li gorî daxuyaniya arteşê, dewleta demikî bi beşdariya kesatiyên teknokirat bona birêvebirina qonaxa veguhastina deshilatê di Misrê de wê pêk bê.

Ehmed Arif berdevkê Parta Deshilatdar a Misrê wate Êxwan Elmuslimîn ragehand ku, Mihemed Morsî û Îsam Elhedad ê cihgrê wî hatin binçavkirin û cihê destbiserkirina wan jî ne diyar e.

Herweha jêderan eşkere kir ku Xeyret Şatir cihgirê serokê Êxwan Elmuslimîn jî ji aliyê arteşê ve hatiye desteserkirin.

Hêjayî basê ye ku di encama şer û pevçûnên navbera dijber û alîgirên Morsî de gellek kesan canê xwe ji dest daye û herweha 360 kes jî birîndar bûne.

www.arsivakurd.org



# Mistefa Hicrî

# Peyama birêz Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDK Îranê derheq roja cîhanî ya xebat li dijî madeyên hişber

**Hemwelatiyê xweştevî! Xwîşk û birayên min yên rêzdar!**

Xisarên berfireh ên bikaranîna madeyên hişber li ser asta cîhanê, û tirs û dilkituka civaka navnetewî li hember vê belaya malwêranker, bûye sedema pêkanîna konfiransek navnetewî bi merema pêşgîriya ji îtiyad û qaçaxkirina madeyên hişber, li bajarê Viyenê a pêtextê Otrîşê, roja 17 heya 26'ê Hezîrana sala 1987'an (27'ê Cozerdanê heya 5'ê Pûşper sala 1366'an). Di vê konfransê de belgeyek hat pejirandin ku li gor wê belgeyê mikanîzmek tevalî derheq kontrolkirina madeyên hişber ji aliyê welatên beşdar di konfiransê de hat diyarîkirin û hemû welat hatin erkdar kirin bona hewlên micid ên navnetewî derheq berberekaniya li hember bazirganîkirin bi madeyên hişber. Ew sened roja 26'ê Hezîranê(5'ê Pûşperê) hat wajokirin û ji wê demê pêve, ew roj weke roja cîhanî a berberekaniya li hember madeyên hişber hat diyarîkirin.
Dewleta Îranê serbarê wan alîkariyên berçav ên NY ku bi merema berberekaniya li hember qaçaxa madeyên hişber werdigire, lê niha bi xwe bûye yek ji torên derfiroşkirin û belavkirina wê di navxwe a Îranê de bi armanca pêşvebirina piroghramek siyasî, bi awayekê ku Sipaha Pasdarên Komara Îslamî bixwe vî erkî cîbicî dike.
Her di vê derheqê de Rojnameya Taymiz dinivîse ku, bazirganîkirin bi madeyên hişber di salê de bi milyardan dolarî mifahê dibexşe Sipaha Pasdaran, herweha yek ji rayedarên Komara Îslamî jî derheq Rojnameya Taymz dibêje ku yek ji armancên Sipaha Pasdaran weşandina derbê ye li welatên Rojavayî.
Di navxweya Îranê de Sipaha Pasdaran madeyê hişber bi merema şikandina kesatiya takên nav civakê bikar tîne, bi awayekê ku hemû haydarin ku di girtîgehên Komara Îslamî de ku di bin çavdêriya tund a Îdareya zîndanan de ye, bidestveanîn û bikaranîna madeyên hişber gelek bi hêsanî tê cîbicîkirin û hejmara wan xortên azadîxwaz û kesatiyên siyasî kêm nînin ku di wan girtîgehand de mu'tad ketine.

Ev siyaseta qirêj û dijemirovî heta derheq neteweyên Îranê jî wate derheq xortên ku xwediyê hesta netewî ne û bona bidestveanîna daxwazên xwe ên netewî xebatê dikin tê encamdan, yek ji wan netewan neteweya kurd e ku bi salane ketiye ber wê ceribandina dijwar û malwêranker de. Di pêxema wê siyasetê de jî rewşek pêk anîne ku madeyên hişber di her cihek Kurdistanê de bi hêsanî peyda dibe, eva di demekê de ye ku ew kesên madeyên hişber di nav civakê de belav dikin, dest û peywendiyên rejîmê ne û hevdem bo piraniya xelkê bajaran û bêguman bo karbidestên rejîmê jî hatine naskirin. Em dikarin bêjin ku bê tirs û nîgeranî, û bi bê şermî dirêjiyê bi karê xwe didin, bê vê ku nîgeranê binçavkirin û cezadanê bin.

Encama vî karê rejîmê jî bûye sedema vê yekê ku roj bi roj hejmara tûşbûyên madeyên hişber bitaybet di nava ciwanan de ber bi zêdebûnê ve here û her eva jî bûye sedema nîgeraniya tewahiya malbatan.
Serokê polîsê bi nav berberekanî li hember madeyên hişbr li parêzgeha Kurdistanê bas ji 21 hezar tûşbûyên madeyên hişber di vê parêzgehê de dike, bi vî halî jî Serdar Newrozî ku yek ji berpirsyarên vî warî ye dibêje; "Kurdistan piştî Îlamê yek ji parêzgehên herî paqij e derheq madeyên hişber". Li gor gotinên karbidestên rejîmê hekî Parêzgeha Kurdistanê parêzgeha herî paqij be, dibe rewşa parêzgehên din ên Kurdistanê çawan be?
Xelkê azadîxwazê Kurdistanê!
Rojane li ber çavên me, cîranên me, hevkilasiyên me, zarok û xweşteviyên me bi sedema edetkirin bi madeyên hişber, moma temenê xwe dihelînin û her yek ji wan jî tevî vê helandinê, jiyana malbata xwe jî dihelînin. Ew belaya han weke agirekê ketiye nava civaka me de û ne tenê her niha, belkê pêşeroja civakê jî ber bi wêraî û rûreşiyê dibe. Hikûmet jî ku dibe berevaniyê ji ciwanan ku sermayeya civakê ne bike, bi awayek sîstimatîk ji vê diyardeyê mifahê werdigire bona jinavbirina potansiyêl û şiyana xebata rizgarîxwazaneya Kurdan û riyên vê xebatê.

Bi vî awayî nabe em çavnihêriya vê yekê bikin ku rejîma Komara Îslamî rêçareyekê bona rizgarbûa netewa me ji vê arîşeya mezin peyda bike, belkî dibe em bi xwe destbikar bin bona rêgirtin ji tûşbûna xortên me bi vê nesaxiyê û herweha çereseriya kesên tûşbûyî. Her takekê kurd di vê derheqê de berpirs e û erkê ser milê wê/wî ye ku, li gor şiyan û hêza xwe alîkar û beşdar be bona berevpêşvebirina vê piroseyê, hekî ne zarok û xortên me ku sermayeya pêşeroja weatê me ne, ji me nabihorin. Hekî di vî karî de fîdakariyê ji xwe nîşan nedin, pêşeroja me civakek bêhiş, nesax û mirî ye, lewra heta rojekê zûtir destbikar bin, emê canê çend xortan rizgar bikin û kevirekê li ser bingeha civaka zindî û bextewer a pêşerojê danên ku ew jî zarokên me ne.

Ev erkê pîroz ji du beşan pêk tê û hewce ye ku her du beş mil bi milê hevdu bêne birêvebirin:
Beşa yekem beşa pêşgîrî û hişyarkirina endamên civakê bitaybet ciwan û herzekaran e, di vê beşê de hêzên civakê ku dikarin alîkar bin zaf in.
Mamostayên xwendingeh û zanîngehan ku texa hişyar, zana û berpirsyar di civaka me de ne, ronîkirin û hişyarkirina ciwanan li ser kilasên dersê û cihê karkirinê de weke erk lê binêrin û lawên Kurd ji metirsiyên madeyên karesatbar û merghîner haydar bikin.
Herweha dayîk û bav jî bi awayek guncav haydarî riftarên zarokên xwe û çawaniya hevalên wan bin, bi taybet di demsala Havînê de ku xwendingeh tên daxistin û xwendekar bêkar dimînin û îmkanatên tefrîhî û sergermkirinê ên rojane jî di bajar û bajarokên Kurdistanê de tunînin û yan jî pir kêm in. Hewce ye ku dayîk û bav hewlê bidin ku di wî heyamî de zarokên xwe bi karek baş û li gor îmkanatên xwe mijûl bikin.
Mamostayên olî ên nîştimanperwer jî di mizgeft û rûniştinên xwe de tevî xelkê li her cihekê, hecwe ye ku metirsiyên tûşbûn bi madeyên hişber û şûnwarên wê di warê olî û civakî de bas bikin û ji vî karî mandî nebin.

Lê beşa duyemîn ya vê erkê pîroz alîkarîkirin bo terikkirina madeyên hişber tevî wan kesan ne ku tûşî vê belayê bûne, di vê peywendiyê de rû dikme dewlemendên xêrxwaz û nîştimanperwer ên welatê xwe û bona vê ku bi tenê û yan jî bi kom di bajaran de nawendên hêzpêdan û terikandina îtiyadê pêk bînin û îmkanatên dermanî û rewandermaniyê bona tûşbûyan cîbicî bikin. Pizîşkên vî warî û şarezayên civaknasiyê hewce ye di wan nawenda de bona serkevtina piroseyê alîkar bin. Ev beşdariya han di warê exlaqî, netewî û olî ve rekê ser milê tev aliyekê ye. Eva ku maye ez basê jê bikim ev e ku di vê beşê de û di çareserkirina tûşbûyan de, hewce ye ku weke kesek nesax ji kesê tûşbûyî bê nêrîn nek weke tawanbarekê û, di cihê wê de ku bê îzole kirin û di rastî de di vê jiyanê de ku mirinek hêdî ye bi tenê bihêlin, di warê derûnî de alîkariya wan bikin û bona terikandin û rizgarî ji vê nesaxiyê moralê bidin wan.
Xatircem im ku hekî her kes di vê peywendiyê de erkê xwe bi başî birêve bibe, gellek ji wan nesaxan wê bên çareserkirin û di encam de emê bibin xwediyê civakek saxlemtir, zindîtir û bextewertir. Bila me hemûyan di avakirina civakek weha de şanaziya beşdariyê hebe.

**Sipasiya we dikim**
**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê giştî yê PDK Îranê**
**4'ê Pûşpera sala 1392'an a Rojî**

www.arsivakurd.org

# Şîva Xerîban

## Beşa: 4



Ez pêştir bi salan di xizmeta Mam Hêmin de bûm û çend salan li xaniyekê û di binkeyeke hizbî de bihevre jiyan kiribû. Mam Hêmin li gorî edetên xwe çi bo ewên ku jê hez dikirin û çi jî bo ên ku jê hez nedikirin tevn li wan didan, her tim gotinên bê mînak pê bûn, û bi pêkenîn û nîve pêkenîn pêkenokên xwe digotin û wek edetên pêşîn dest bi axavtinên xweş kirin û rû li Erîf Qadir kir û got: “ Çayeke semawer bidnê”. Armanca wê ji semawer ew çaydanê reş ê rex agir bû. Min di dilê xwe de got: “ Ber bî xeberanê keşkek selewat”. Wî nedizanî ku min çi xeberek tall heye, wî nedizanî ku çi gorriyek di derûna min de diteyîse. Ez û şehîd Celal xelkê herêmekê nebûn. Mebesta min ew şêweya parvekirina kurdewarî ye, ya herêmê ye.

ez xelkê gundê ser sînorê Swîsnayetî û Gewirkayetî bûm û ew jî bi eslê xwe Nellênî, lê akinciyê Mengorayetî wate gundê Mîrawê bûn.Ez û kak Celal li çend birgeyên dîrokî ên xwe de, em bi hevre bûn. Car hebû ku çend salan em bi hevre bûn, li xwendina hucreyan de jî carna bi awayê otomatîkî, dikevtne cem yektir. Di dema feqiyatiyê de, Zêd û Emrûn em berdabûne hev. Em şahidê sing kutanê û gilolka wan du kesayetiyên wek mişk û pîşikên nav qewaîda Erebî bûn. Qisên xweş ên Mam Hêmin û keniya kak Elî û Silêman û cemaeta wî çi bandorek li ser min nedidanî. Di rastî de wek vê bû ku min her guh lê nebibe, tewaya hiş û bîra min li ser vê bû ku çawan û bi çi peyvan xebera dîlgirtina Celal ragehînim. Lê min her çi dikir, nedihate ser devê min ku bas bikim.

Baş li bîra min de ye ku ez sergêj bibûm û min nedizanî ku çi bikim, li bîra min de ye ku çendîn carî ne bizanebûn, min kum û cemedaniya serê xwe radikir û didanî, min tund xwe li pişta erdê qahîm dikirm wek vê ku ez li ser pişta hespeke serkêş bim û xwe li ser piştê tund kim ku nekevme xwarê. Demek gellek hestiyar bû, mam Hêmin hest bi lawazî û bê hêziya min kir û li ber xwe de got: “ Keko beeciye û bêsmillah ji destê pasdaran cindar bûye”. Min nekarî ku bersiva wî bidim, piştî çend caran kuxînê û paqijkirina geviya xwe min taqet anî ber xwe û bi dengek bêhêz min got ku Celal dîl hate girtin. Mam Hêmin bi dengek bilind got çiiii? Min gotê Celal dîl hate gitin. Ew nûçeya bû Qurquşm û kete geviya me tewayan de. Ken û girnijîn nema û mir. Bêdengiyek tewaw bi ser me de zal bû, mam Hêmin çirijî, û pirs kir ku gelo Bêhrûz jî şehîd bû, min got ne, ew sax û silamet e. Ew çû nav gund û soz da ku zû vegere. Ew nûçeya bo hevalan nexweş nebû, piştî kêmek geş bûnê dîsan mam Hêmin nav xwe de çû, bi lez cixareyek pêkir û nefesek kûr lê da, û Erîf Qadir agir xweş kir û dest bi duakirinê kir, kak Elî Heseniyanî jî sor bû, û Silêman çavên wî pirr ji rondik bûn, û Hecî û Mela Xidir giryan, ên din jî li pey wan dest bi giryê kirin, hemû giriyan, min mergê ezîzan gelek dîtibû, Mo’înî û Aware û Şerîfzade, Niho, amaosta Zengene, û hevalên dewrana ciwaniyê, wek Kawe, Qerenî, mele Elî wergêlî, Mihemed Resûwe Mereyî, Salih Lacanî û Solêymanê Kereqeşûanî, û Elî Giwêreş û dehan şehîdên qehremanên din di girtîgehan de destê hesret û keserê min li ser çokê xwe dabû.



Bi bawera min gellek eybe ku mirov basê giriyê bike, lê ez naxwazim ku direvan bikim, ez naveşêrim ku ez gellek caran li wargehê hevalên şehîd de min bi tenê kiriye şîn û tazî, û li çepera bi cih mayî ya emegnasan de, min bi tenê rondik rijandibûn, lê taziya vê şevê li vê tarîtiyê de ji min re gellek bîhanî bû.

Kak Elî Heseniyanî wek vê ku li xewnek nexweş û xevek giran hişyar bibe, rabû û got: “Min jêve ye ku bi bê berhevdanek hûr û nirxandinahêzên her du aliyan ew pevçûn pêk hatiye”. Kak Silêma bi bê qisekirin û bi hejandina serê xwe boçûna kak Elî piştrast kir, mam Hêmin jî bi edetên xwe yên şaîrane, boçûnên hevalan bi awayek din piştrast kir û got: “Her kê ba Fûlad bazî pencê ker dSaidê Sîmîn xod ra pencê kerd”. Berxê min hêzek weha mezin bo vê hindê nedibû ku xwe lêdî, serê xwe li taxteberê bidî, serê te wê kerker be”.


Mam Hêmin hinek caran bo muxatebê xwe peyva berxê min bi kar dianî. Min boçûna wan wek

*li wargehê hevalên şehîd de min bi tenê kiriye şîn û tazî, û li çepera bi cih mayî ya emegnasan de, min bi tenê rondik rijandibûn, lê taziya vê şevê li vê tarîtiyê de ji min re gellek bîhanî bû*

eslek mentiqî lê dûr ji munasibet bi tewahî qebûl bû, lê hinek tişt hebûn ku diviya bi hûrî hatiban şirovekirin, min çawaniya vê bûyerê ji wan re bas kir, li wir de ez bas nakim û renge li cihê xwe de ez basê bikim. Wan hevalan ji min pirs kir ku gelo dujmin derbe xwar yan ne, min jî gote wan ku ez xatircem im ku bê zirar nevegeriyane, bê vir û derevan û ya ku min bi çavê xwe dîtibû min bi hûrî wan re bas kir ku li wir de ez naxwazim ku basê zirarên dujmin bikim, ez ku li hember axavtinên hevalan de bi tewahî ketibûme rewşa bergirîkirinê, min gote wan ku kak Bêhrûz Kurdehmedî ku beşeke şer bi çavê xwe dîtibû dikare hûrdekariyên vî şerî ji we re bas bike, kak Bêhrûz hemseferê we ye û êvariyê soz da min ku zû vegere cem we û gellek zanyarî li cem wî hen. Mam hêmin ku şahidê têkçûnamin bû, rûgeştir got ku cihê mêrekî gellek vala ye, lê dîrok ew e ku bû û dibe, ne ya ku em jê hez dikin... Dom heye

www.wankurdi.org

# Nerîna Lîder-an



Kemal Burkay:

**“Ji bo çareseriyê pirojeyeke weha tune ye”.**



Kişanak:

**“Kurdên Turkiyê amadeyiya şewitandina zewiyên maddeyên hişber hene”.**



Ehmedînijad:

**“Heyamek e ku min dest di pirsa navikî de nine”.**



Rûhanî:

**“Dewletek bihêz nayê wateya vê ku destêwerdanê di nav jiyana şexsî ya xelkê de bike”.**

# Gelo Turkiye pirsa Kurd çareser dike yan ya PKK





Rostem Cehangîrî

Me di berî de basa vê kiribû ku dibe çareseriya pirsa kurd be ne çareseriya Pkk, ji ber ku pirsa PKK girêdayî bi pirsa kurde. Hef û mixabin aliyên Turk di hizr û bîrên xwe de tenê pirsa PKK dibînin û di hewl û têkoşîna de ne ku PKK ji holê rakin û ji nav bibin û yan jî razî bi vê bikin ku hêzên xwe ji kurdistana bakûr vekişîne û tenê soz dane, ku dixwazin çareserira pirsa Kurd li Turkiyê bikin.

Dîtina wan eva bû ku pirsa kurd dê çareser be, lê wusa nebû, gelê kurd di dirêjahiya dîroka xwe de selmandiye ku pirsa kurd pirsek neteweyî ye û dibe bê çareserkirin.

Eva ku dijber û neyarên kurd çava dinêrne vê pirsê keyfa wan e, ew naxwazin kurd û netewa kurd hebe û di navbera çar dewletan de hatîne parvekirin û mafê wê nînin bêjin em kurdin û xwediyê ax û welat û ziman û çand û kelepûrên taybetî a xwe ne, eva di nav wan de bive ye û nebe bê gotin, nebe?

Di despêka sala 2013’an de livlivînek di nav bizava kurd li bakûrê kurdistanê dest pêkir û hat ragehandin ku pirsa kurd dê ji rêya siyasî û diyalogê ve dest pê bike, û navê wê jî danîn çareseriya aşitiyane ya pirsa kurd, û pênaseyên faz jêre hatin kirin, lê me dît ku hiviyek zaf çê bû ku eva pirsa kurd tê çareser kirin û li pey endazeyar û şarezayên vê çareseriyê digeriyan û didan nasandin.

Wan ew Pirs weha lê kirin ku her kes gazinde yan bîr û hizrek gotiba, îmkana vê hebû ku mohra îxanetê lê bidin, heya roja newrozê ku nameyeke rêzdar Ebdola Ocelan rêberê zîndanî kirî yê PKK hat bilav kirin û heyf û mixabin di vê namê de tu basek ji kurd û kurdistanê nebû û pirsa kurd wek pirsa neteweyek cuda ji gelê Turk nexistin ber bas.

Me her di vê demê de bîr û hizrên xwe bi eşkere ragehandin û me got em alîgirê çareseriya pirsa kurd li her beşekê ji rêya aşitî û diyalogê ne, lê mixabin evên tê gotin û bihîstin em xistine nava fikr û hizrên cuda ku di vê çareseriyê de pirsa kurd bê çareser kirin, belkû dixwazin PKK çareser bikin, me got evane bi mifaha gelê Turk û dewleta Turk e û tu mifahek bo gelê kurd nine û PKK jî dibe xwe amade bike bo hin guhertinên dewerê û belkî bi mifaha kurd jî nebe, lê dibe hin kar hen bike, dibe nav mala kurd hevgirtî bike. Mixabin me dît ku wusa nebû.

Aliyê PKK û derdorên wê jî tenê hevgirtinê di xwe de dibînin û dibe derdora wan jî hizr û bîrên wan qebûl bikin, û tu aliyekê qebûl nakin.

Mixabin civînek bi navê konferansa aştiyê pêk hat û çendîn partî û rêkxirawên Kurdî ew civîn baykot kirin, lê ji aliyê PKK û KCK ve tu pêngavek weha nehate avêtin ku aliyên din ên Kurd razî bikin ku baykota civînê nekin, da ku nav mala Kurd yekgirtî be. Heyf û mixabin PKK û KCK ew konferansa xwe girtin. Ew kiryar ne bi qazancê Kurd û ne bi qazancê PKK ye. PKK divêt di nav xwe de jî aştiyê pêk bîne da ku çeperên wê bihêztir bin.

Di bûyera parka Gezî di despêkê de derdora PKK baş helwest girtin, lê mixabin di dawiyê de ketne dawiya çepên tundrewên Turk û li ser vê parkê zaf tund çûne pêş û di vê demê de ev helwest bi ziyana bizava kurd bû, ji ber ku hikumetê digot ev xwenîşandan ji bo vê hindê hatîne çêkirin ku pirsa çareseriyê sernegire, herçend ji aliyê serokê KCD rêzdar Ehmed Turk ve bersiva Sirî Sûreyaonder endamê bilûka Kurd li ser girûpa çep a Turk hat dan ku rexne li KCK girtibû ku çima li ser wan bûyeran helwest negirtiye, û got armanca me tevî armancên wan yek nînin ku dixwazin bi behaneya parka Gezî hikumetê hiloşînin, ne em vê hindê naxwazîn, lê helwest her çi qas direng bû, lê helwestek bi cih bû, û raya gelê Turk û dewleta Turk bi erênî wergirtin. Şere ragehandinek din di navbera aliyên kurd û aliyên hikumetî heye û hevdu tawanbar dikin ku ji helwestên xwe peşîman bûne, eva di nav aliyên diyalogê de gellek asayî ne, lê divêt ku aliyê kurd behana nede derdorên dewletê, ji ber ku hin alî naxwazin navê kurd jî hebe û nabe ev hêviyên ku dane gelê kurd herwusa ji nav biçin.

Em bi hûrî vê pirsa aştiyê dişopînin û li bendê ne ka ew pirs wê bigîje kîderê.

www.arsivakurd.org

# Şêx Seîd qehremanê kurd






A: Şehab Xalidî

Di dawiya sala 1922'an ku Ataturk deshilat bidestve girtibû, du kesayetiyên naskirî bi navênYusif Ziya nûnerê xelkê Bitlîsê û serheng Xalid Bêyg nûnerê xelkê Cebran, komîteyek li jêr navê Komeleya serxwebûna Kurd li bajarê Erzroromê pêk anîn, û tayên vê komîteyê li bajarên din de jî hatin avakirin. Piştre Îhsan Nûrî paşa ku jineraleke erteşê bû û pileya efserî hebû, çû nav refa vê komîteyê.herweha ji kesayetiyên mesebî jî Şêx Seîdê Pîran, Şêx Şerîf Palo û Şêx Ebdulla Melekan bi vê komîteyê ve zêde bûn û dest bi komkirina hêz û rakêşana kesên naskirî wek serikeşîr û kesên olî bo nav vê komîteyê de kirin.

Di dema hewl û tekoşîna bo destpêkirina şoreşê, Seyîd Ziya û serheng Xalid Bêyg ji avakerên vê komîteyê hatin destbiserkirin û li 14'ê Şibata sala 1925'an de Şêx Seîdê Pîran herêma rizgarkirê ya Darhîn wek paytextê demî ê Kurdistanê ragehand û bi vî awayî şoreşê bi awayek fermî dest pêkir, û di heyamê mehekê de karîn yek ji sê a xaka Kurdistana Turkiyê rizgar bikin, û bajarê Diyarbekir jî dorpêç bikin, û berv gola Wan û heta bilindahiyên Agirî û heya Bitlîsê jî pêşrewiyê bikin.

Vê şoreşê karî ku di vî heyamê kêm de ew qas deskevtan bi dest bixe, û eva jî bo dewleta Turkiyê şikestek ew qas giran bû ku biryar da tev hêza xwe bi kar bîne bona vê ku dîsan xaka Kurdistanê bêxe jêr lepê xwe de. Lewra hêzeke 80 hezar kesî amade kir û 35 hezar kes ji vê hêzê jîli ser îzna dewleta Feranse mifah ji riya hesin ya bakûrê Sûriyê wergirtin û ji vê riyê ve bajarê Diyarbekir jî dorpêç kirin û riya bajarê Wanê jî tevî beşa rojhilat û tevî Gola Wanê qut kirin.

Di dawiya meha Xakelêweya sala 1925'an Şêx Seîd û hevalên wî piştî berxwedanek cesûrane mixabin hatin destbiserkirin û Yusêf ziya û serheng Xalid Bêyg bi çend hevalên xwe re hatin bidarvekirin, û heya ên ku pêwendiya wan jî bi şoreşê re nebû, wek Dr. Foad û Ekrem Beg û cemîl Paşazade û Tofîq Bêyg di dadgeha leşkerî de cezayê bidarvekirinê bi ser wan de hate sepandin, û li ser yek 52 kes hatin bidarvekirin. Berpirsyarên dewleta Turkiyê herweha dest kirin bi çêkirina perwendeyên ajantiyê bo kesayetiyê naskirî û herweha serokê Senaya dewleta Osmanî wate Şêx Ebdulqadir Geylanî û her bi vê tometê jî ew îdam kirin.

Piştî vê hemû kuşt û kuştara Kurdan ji aliyê dewleta Turkiyê ve rewşeke tund ya ewlehiyê bi ser welat de ahte sepandin û piraniya rêkxiraw û heta rojname û kovar hatin daxistin. Her di vê derheqê de berpirsyareke leşkerî ê Birîtanyayê bi navê Armistrang dibêje: "Kurdistan kete nav agir û mêr hatin îşkencekirin û gund hatin şevitandin, û jin û zarok hatin kuştin. Li gorî serjimêriyên ne fermî nêzîk bi 2300 gund bi tewahî hatin kavilkirin û 15 hezar kes ji xelkê bê berevan jî hatin kuştin".

Dewleta Turkiyê bona xapandina xelkê Turk û rakêşana wan bo aliyê xwe digot: "Vê tevgerê reng û rûyê mesebî heye û alîgirên xilafetê û dijberên cudahiya dîn ji dewletê ew tevger hay dane. Herweha armanca vê tevgerê jî avakirina Kurdistaneke serbixwe û parvekirian xaka Turkiyê bûye. Herweha destê Birîtanyayê jî li pişt vê şoreşê bûye".

Nehro di pirtûka "Lênihêrînek li dîroka cîhanê" de weha bas ji dewleta Turkiyê dike: "Turkan ku taze bo azadiyê xebat kiribûn, dest bi tepeseriya Kurdan kirin, ku wan Kurdan jî her bo vê azadiyê xebat dikirin. Ecêb e ku çawan nasyonalîzma bergirîkarane diguhere bi nasyonalîzmeke êrîşkarane û xebat bona bidestve anîna azadiyê diguhere bi xebata bo zalbûna bi ser ên din de".

Herçend ew şoreş weha hovane hate tepeserkirin, lê çêbûna şoreşên din selimandin ku tepeserî û zulm û zordarî herçend hovane jî be, nikare gelê Kurd ji xebata bo gihîştina bi mafên xwe paşve vegerîne û ew şoreş heya niha jî dom heye û hêviya gihîştin bi azadiyê ji her demek din geştir e.

Çavkanî: "Tevgerên neteweyî ên Kurd"

# Kîmiyabarana Serdeştê



Hiwa Mîrzayî


Bidestvegirtina deshilatê ji aliyê rêberên rejîma Îranê ve û şandina şoreşê û îslama Şîe û dana dirşmên wek riya Qudsê ji Kerbelayê ve derbaz dibe, û siyasetên tunde deshilatdarên wê demê ên Komara Îslamî û têkçûna balansa berjewendiyan li herêmê yek ji wan sedemên çêbûna şerê malkambaxker ê di navbera Îraq û Îranê de bû.

Kurdistan bi sedema sînorê berfire di gel Îraqê yek ji wan herêman bû ku zirara herî zêde dît, û li encam de bi hezaran kes ji xelkê sivîl di herêmên Kurdistanê de bûne qurbanî.

Yek ji wan tirajidiyên ku li serdemê şerê her du aliyan de pêsîra xelkê Îranê girt, kîmyabarana bajarê Serdeşta ser bi parêzgeha Urmiyê bû ku li 7'ê Pûşpera sala 1366'an (Hezîrana 1987) bû armanca êrîşa rejîma Be's û li encama vê kiryara dijîmirovî deli gorî serjimêriya Rojnameya Keyhan nêzîk bi 60 kes hatin kuştin û 2000 kes jî birîndar bûn.

Helbet ew serjimêrî bi sedema mifahwergirtina rejîma Be's ji gaza Xerdel û derketina şûnwarên gazê li çend salên din, rêjeya miriyan zêde bûye, û nêzî bi 300 kes li encama vê êrîşê de hatine kuştin û nêzîk bi 8000 birîndar jî hene, û egera bilindbûna wan serjimêriyan jî her heye.

Mixabin heya niha rejîma Îranê hewla bi cînosayd nasandina vê kiryarê nedaye, û beşek zêde ji birîndaran heya niha jî ji destê şûnwarên vê kiryarê de her dinalînin, û bi sedema kêmtirxemiya karbidestên rejîma Komara Îslamiya Îranê ji dermanên hewce bê par in, û bandorek pirr xirap li ser derûna xelkê vê herêmê dani-




Dom: R 10'ê

www.arsivakurdi.org

# Terora Komara Îslamî




## Ebdulla Hicab

Mijara terorê weke emrazê siyasetê di destê dewletên xedar de ku xwe bi tu pîvan u prensîpên exlaqî, mirovayetî u siyasî ve girêdayî nizanin, ne diyardeyek nû ye. Lê ya ku Komara Îslamî ji wê diyardeya derveyî exlaqê mirovatiyê zêde kir, reng u pîvana olî bû. Li gor nêzîkbûna rêjîma Îranê, ne tenê ji navê rakirina fîzîkî ya rexnegir u dijberên siyasî dikare karek rewa be, belkû encamdana wê dibe erkek pîroze olî ku dikeve ser milên rêvîngên rêbaza olî ya ku Ayetullah Xumeynî bi sîstema Wilayetê Feqîh re li Îranê damezirand.

Terorkirina Dr. Abdulrehman Qasimlo, sekreterê giştî yê PDKÎ di sala 1989'an de, pêwîste li gor wê nêrînê were dîtin u nirxandin. Bikuj kesên herî emîn ên Komara Îslamî u girêdayî serokê olî Xamineyî bûn ku piştî mirina Xumeynî, li ser mîrata wî ya fikrî u siyasî rûniştibû u bi biryar bû ku wesiyet u rasipardeyên Xumeynî, yek bi yek bi cîh bîne. Di warê siyasî de, tenê Rojhilata Kurdistanê karîbû li hember êrîşên berbilave Komara Îslamî bo ser azadî u demokrasiyê berxwe bide u ruhê berxwedan li hember dîktatoriya olî de zindî rabigre. Di serî de erka mezine wê berxwedanê li ser milê PDKÎ û sekreterê partiyê, Dr. Qasimlo bû ku ji roja yekê ya destelata Komara Îslamî ve, ji dîktatoriya olî re gotibû NA.

Pilana terorkirina Dr. Qasimlo beriya mirina Xumeynî, bi hevfikiriya Haşimî Refsencanî, Elî Xamineyî, Ekber Wilayetî u Mihemed Reyşehrî ku wê demê wezîrê Îstixbarata Îranê bû hate dariştin u ji aliyê serkirdeyên asta herî bilinde Sipaha Pasdaran ve hate birêve birin. Di gel ku bikuj kesên emîn yên asata xwarê di Sipahê Pasdaran de bûn, lê rola sereke di terorê de li ser milê Haşimî Refsencanî, Elî Xameneyî u wezîrê derveye wê demê Wilayetî bû ku bi awayê raste rast ji Xumeynî ku beriya demekê miribû ferman girtibûn.



Komara Îslamî piştî ku şerê li hember Îraqê dorand, dixwest di astên navxwe u dereve de ji aliyekê ve bandora wê şikestinê veşêre u ji aliyek din ve xwe ji qeyranên rengeyî ku dikarîn bi şikestina di şer de jê re pêk werin rizgar bike. Hebûna kesayetiyek siyasî weke Dr. Qasimlo di nava rêza dijberên Komara Îslamî de, li ser riya rêjîmê astengek xuya bû. Ji ber ku Qasimlo, li Kurdistanê bi der, di asta Îran de u li ser pêwendiyên Îranê bi cîhanê re siyasetvanek bû ku dikarî xwedî bandor be. Ev pêgeh ne bi dilê Komara Îslamî u rêberên wê bû.




Di dîroka Îranê de, nêzîkbûna deshelatdaran bi rêberên Kurd re, her demê nêzîkbûna dijminkarane u bi mebesta ji navbirinê bûye. Komara Îslamî dema li ser wê mîrata rûnişt, bi awayek xwezayî dihate çaverê kirin ku dijminayetiya xwe bi rêberên Kurdan re berdewam bike. Ji wê jî hê metirsîdartir rengê olî ye nêzîkbûna Îranê bi mijara terorê re bû ku çi guman nedihêşt ku ew rêjîm li her derê ku derfetê bibîne, şûrê xwe yê bi jehrî li dijî rêber û tevgera Kurd bikar bîne. Di gel wê nasînê jî, Dr. Qasimlo dixwest şansekê bide aştî u çareseriya pirsa Kurd li Îranê. Lê bi piyên xwe ber bi davikekê ve çû ku ji bo wî bi xwe, tevgera siyasî u ji bo gelê Kurd pir giran ket.

Bi teror kirina Dr. Qasimlo re, rêjîma Komara Îslamî xwest hêviya gelê Kurd ji bo azadiyê bişkêne u pêşerojê tarî bike, lê encama ku rêjîmê ji wê cinayetya xwe girt berevajî bû. Ji ber ku Qasimlo beriya ku bikeve davka bi fen u xape Komara Îslamî, hêviyek wisan giranbuha dabû gelê Kurd ku bi çi hêz u pilanan nayê şikandin. Lewma komara Îslamî bi terora wî bêbaweriya li hember xwe zêde kir, pêşeroja xwe reş kir u îradeya gelê Kurd ji bo dijberiya li hember xwe xurttir kir.

Niha 24 sal piştî terora Dr. Qasimlo, gelê Kurd ne tenê li Rojhilata Kurdistanê, belkû li hemû beşên welat u li wan deverên cîhanê ku Kurd lê dijîn pitir ji dema jiyanê, bi armanc u hêviyên Dr. Qasimlo ve girêdaiye.

Ala berxwedana li hember dîktatorî u paşverotiyê ji caran bilindtir e, xebata gelê Kurd gîhaye astekê ku êdî paş ve gavan navêje u roj bi roj zêdetir ji hêvî u armancên Dr. Qasimlo nêzîk dibe. Komara îslamî jî di nava gemara kiryarên xwe yên derveyî pîvanên mirovatiyê de wisan nuqum bûye ku roj bi roj pitir ber bi pêşeroja tarî ve diherike.

www.arsivakurd.org



Eli Cehanbexş

**Birêz Elî Hesenpûr naskirî bi Elî cehanbexş, kurê Mihemedemîn, sala 1340'ê (1961'an) li gundê wGirdikşan a ser bi herêma Lacan a Pîranşarê hatiye dinê.**



Dr. Sadiq Şerefkendî — Elî Cehanbexş

Hevpeyvîn: Arif Vêlzî

*"Dema hêz ji avê derbaz bû, pênc pêşmerge di nav avê de xendiqîn û mixabin me nekarî bona rizgarkirina wan tu karekê bikin û heta termên wan jî nehatin peydakirin".*

Elî Hesenpûr naskirî bi Elî cehanbexş, kurê Mihemedemîn, sala 1340'ê (19661'an) li gundê Girdikşan a ser bi herêma Lacan a Pîranşarê hatiye dinê.

Elî Hesenpûr temenê zarokatiya xwe di malbatek cotkar de derbaz dike heya temenê dersxwendina wî tê. Wî çaxî sala yekem û duyem a despêkî, ji rêya Sipaha Daniş ve dixwîne, piştre bi sedema nemana Sipaha Danêş li devera wan, padigana rejîma Pehlewî li Girdikşanê (Padigana Peswê) radigehîne ku zarok dikarin bên û di nava padiganê de dersê bixwînin, lewma sê salên xwe ên xwendinê li wir dixwîne. Piştre sê salê nawendî jî di nav padigana Celdiyanê de dixwîne û bo sala yekem a Debîristanê, ber bi bajarê Pîranşarê ve diçe. Sala yekemîn a paşnawendiyê (debîristanê) bidawî tîne, û di Cozerdana sala 1358'an (1979'an) de biryar dide ku tevlî şoreşê be.

Navbirî di vê derheqê de dibêje: "Bi sedema vê ku kurmamê min bi navê Bayîz Hesenpûr pêşmerge û kurxalê min bi navê Ebdulla Îbrahîmî berpirsê Komîte Şaristana Pîranşarê bû, min PDK Îranê bo xebat di pêxema azadiyê hilbijart û ez tevlî refên wê bûm".

Elî Hesenpûr derheq rojên herî xweş ên jiyana xwe dibêje; "Jiyana pêşmergatiyê pir e ji zehmetî û nexweşî, lê dema ku em diçûn menteqê û digel rêz û pêşwaziya germ a xelkê menteqê û Kurdistanê bi giştî berbirû dibûn, tewahiya nexweşî û zehmetî û dûriya malbatî li bîra me de nediman û em dilşa dibûn, lewra tewahiya menteqe çûnên me xweş bûn û tu caran nahên jibîr kirin".

Lê Elî roja herî nexweş a jiyana xwe jî weha tîne ziman û dibêje: "sala 1366'ê biryar dan ku Komîte Şaristana Pîranşarê ber bi menteqê ve here. Hêz bi Fermandehiya Seyîd Resûl ber bi Pîranşarê ve bi rê ket û di nava rê de em gehîştin Çemê Kelwê (Çemê Badînawê). Hewce bû ku em xwe li ava çem bidin da ku derbasî aliyê Pîranşarê bibin, hêz bi ser çend Pelan de dabeş bû û her carê pêşmergeyên pelekê xwe li ava çem didan û derbaz dibûn. Dema hêz ji avê derbaz bû, me lê nêrî ku pênc pêşmerge nediyar in. Eva roja herî nexwş a jiyana pêşmergatiya min bû, jiber ku pênc pêşmerge di nav avê de xendiqîn û mixabin me nekarî bona rizgarkirina wan tu karekê bikin û heta termên wan jî nehatin peydakirin.

Elî Hesenpûr derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje; "Bi sedema giraniya karê partiyê û zehmetbûna erkê pêşmergatiyê, ez hinekê direng ketim hizra pêkanîna jiyana hevpar, lê di 01.06.2000'ê (1379'an), li Binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê de min jiyana hevpar tevî "Gulê Ehmed" xelkê Bajarê Silêmaniyê pêk anî û berhema jiyana me jî sê Kur in.

Elî Cehanbexş piştî derbazkirina 34 sal ji temenê xwe di nava şoreş û PDK Îranê de dibêje; "Min temenek di nava PDK Îranê de derbaz kiriye, lewra ez vê partiyê bi başî nas dikim, Ez dizanim ku partiya me partiye û hiukumet nine ku dahatek baş hebe û bi başî bi kadr û pêşmergên xwe re bigîje, lewma ez bi jiyana nava partiyê de bi tewahî razî me, bi tewahiya kêm û kuriyên wê ve, û hertim şanaziyê jî bi jiyana xwe dikim".

Elî rû li xelkê Kurdistanê dike û hevpeyvîna xwe bi vê gotinê bi dawî tîne; "Xelkê bi şeref û leheng ê Kurdistanê, ez daxwazê ji we dikem ku her weke we pêştir îsbat kiriye ku, piştevanê partiya pêşeng a xebata gelê Kurd li Rojhelatê Kurdistanê bûnê, niha jî cardin peymana xwe tevî vê partiyê nû bikin û piştevaniya tevalî jê bikin û herweha nekevin tevlikên Komara Îslamî de, jiber ku bi hemû hêz û şiyana xwe hewil dide ku, gelê Kurd di Rojhelatê Kurdistanê de, jinav bibe.



www.arsivakurdi.org

# Rojhejmêra binpêkirina mafên jinan di Kurdistana Rojhelat de

**Ajansa nûçegehaniya Kurdpa bi armanca zêdetir eşkerekirin û şirovekirina binpêkirina mafên jinan di Kurdistana Rojhelat de, sê heyvan carekê, raporekê berhev dike, ku li gorî rapora sê heyvên destpêka sala 1392'an (21'ê Adar heya 21'ê Hezîranê), binpêkirina mafên jinan bi vî awayî ye:**

**Heyva Xakelêwe: (21'ê Adar heya 21'ê Nîsanê)**

6.1.1392 (26.3.2013): Jinek 38 salî bi navê "Nesrîn" dayîka sê zarokan û xelkê bajarê Pîranşarê, xwe daliqand û dawî bi jiyana xwe anî.

8.1.1392 (28.3.2013): Li Gundê "Qizil Arix" a ser bi Bajarê Makûyê, keçek 20 salî bi navê "Elem Hûlî" keça Hesen, agir berda canê xwe û dawî bi jiyana xwe anî.

14.1.1392 (3.4.2013): Li Gundê "Pencerelû" ya ser bi Bajarê Makûyê, keça kesekî bi navê "Bekir Resûlîtaş" xwe avêt nava çemê "Qere sû" de û di encam de canê xwe ji dest da. Nasnameya wê keçê nediyar e.

15.1.1392 (4.4.2013): Fatîme Perwîzî jina destbiserkirî ya Kurd ku bi sedema başnebûba rewşa cesteyî heyamê 5 rojan îzna çûn bo malê wergirtibû, bi sedema kêmiya heyama îznê(morexesî) û herweha dûrbûna navbera girtîgeh û mala wê, bi awayek hewce çareseriyên pizişkî jêre nehatin kirin û di encam de cardin bo girtîgehê hat şandin.

16.1.1392 (5.6.2013): "Çîmen Emûyî Mîlan" ya 18 salî, keça Omer û xelkê Gundê "Qizil dax Kurd" a ser bi Bajarê Makûyê, agir berda leşê xwe û di encam de, li nexweşxaneyek Bajarê Ûrmiyê de canê xwe ji dest da.

18.1.1392 (7.4.2013): "Şanaz Hadiyan" temen 18 salî û keça Mecîd, xelkê Gundê "Kiş Arxî" a ser bi bajarê "Şûtê", agir berda leşê xwe û di encam de bi sedema şevitîna pitir ji %60 leşê wê, canê xwe ji dest da.

18.1.1392 (7.4.2013): jinek temen 50 salî bi navê "Zohre Şîrzad" bi sedema vê ku roja 10'ê Xakelêwê ji aliyê du kesan ve bi Matorê û bi merema dizîna canteyê wê, ketibû ber êrîşê û di encam de xwînrêjiya Mêjî kiribû, li nexweşxaneya Bajarê Bokanê canê xwe ji dest da.



19.1.1392 (8.4.1391): "Nida Şehsewarî" keça werzişvan a Kurd, bona beşdarî di pêşbirkêya Pîng Pong ya Asiyayê, digel dijatiya "Civata Derwey Sînor" (birûn merzî) ya lîstokên navnetewî berbirû bû. Civata navbirî tenê jinbûna navbirî weke sedema rênedan bo beşdarî di pêşbirkêyê de ragehandin.

23.1.1392 (12.4.2013): Kiçek herzekar bi navê "KM" keça Elî û xelkê Bajarê Şinoyê, bi sedema arîşeyêm malbatî xwe daliqand û dawî bi jiyana xwe anî.

26.1.1392 (15.4.2013): Gerandina tawanbarekê bi kincên jinan di nava Bajarê Merîwanê de, nerazîbûnek berfireh a çalakên jinan û mafên mirov li ser torên civakî bi dû xwe re anî.

28.1.1392 (17.4.2013): Jinek temen 33 salî bi navê "Şermîn Efrûşte", dayîka du zarokan û xelkê bajarê Merîwanê, bi sedema arîşeyên malbatî agir berda leşê xwe û dawî bi jiyana xwe anî.

**Heyva Banemer: (21'ê Nîsan heya 21'ê Gulanê)**

2.2.1392 (22.4.2013): "Zêneb celaliyan" jina destbiserkirî a Kurd ku digel nesaxiya çavan berbirû ye, serbarê hewlên zaf ên malbata navbirî, karbidestên girtîgeha Dîzilabada Kirmaşanê ji dana îzn(morexesî) bona çareseriya pirsgirêka çavên Zêneb Celaliyan xwe diparêzin.

7.2.1392 (27.4.2013): Li bajarê Sinê û di dema ku "Re'na Ra'êdî" û hevjînê wê "Xalîd", bi merema telaqê ber bi mala "Mela E.K" li Taxa Feyzawaya Bajarê Sinê ve diçûn, şer ket navbera wan de û di encam de Re'na bi destê hevjînê xwe hat kuştin. "Xalîd" yek ji endamên Sipaha Pasdaran e.

7.2.1392 (27.4.2013): "Fatime Perwîzî" zîndaniya siyasî a Kurd piştî derbazkirina hukmê xwe li girtîgeha Hewşarê, serbest hat berdan. Navbirî bi tawana bêrêzî bi serbazên bênav û nîşan ên Îmamê Zeman, ji aliyê dadgeha şoreş a bajarê Kerecê ve bi cezayê 6 heyv zîndana "Te'zîrî" hatibû mehkûmkirin.

9.2.1392 (29.4.2013): "Gulzar Cemalî" temen 21 salî, xelkê Gundê "Gilêne" ya ser bi Bajarê Serdeştê, bi sedemek neeşkere hewla kûştina xwe da û di encam de li yek ji nawendên dermanî ên Bajarê tewrêzê canê xwe jidest da.

11.2.1392 (1.5.2013): Keçek Kurd bi navê "Şehîn Rostemî" xelkê Bajarê serdeştê, bi sedemek nediyar agir berda leşê xwe û di encam de canê xwe jidest da.

22.2.1392 (12.5.2013): Keçek bi navê "Nahîd Mexfîret" temen 17 salî û xelkê Bajarê Nexedê, xwe daliqand û dawî bi jiyana xwe anî. Sedema xwekuştina navbrî, rêgirîkirina malbata wê derheq zewicîn bi ciwanê dilxwaz ê xwe re.

24.2.1392 (14.5.2013): "Azer Tahirabadî" keça rojnamenivîs a Kurd û xelkê Bajarê Kengawerê, ji aliyê îdareya Polîsê Ewlehiya Parêzgeha Kirmaşanê ve bo heyamê 10 demjimêran ji aliyê vê nawendê ve jêpirsîn lê hat kirin.

24.2.1392 (14.5.2013): Jinek 26 salî bi navê "Şermîn" xelkê Gundê "Wilejêr" a ser bi bajarê Merîwanê, agir berda leşê xwe û piştî mana 2 rojan di nexweşxaneya wî bajarî de, bi sedema kûrbûna birînên wê, canê xwe ji des da.

26.2.1392 (16.5.2013): Termê jinekê bi navê "Fereh Qeyserî" xelkê Gundê "merran" ya ser bi bajarê Dîwanderê û akincî li Seqizê, tevî keça xwe a sê salî, bi awayek serjêkirî hatin dîtin û hevdem bi qasê 40 milyon Tûmen Zêr û Altûnên wê jî ji aliyê bikujan ve hatiye dizîn.

28.2.1392 (18.5.2013): Keçek din a Kurd bi navê "Dîdar Husênî" ku heyamê heftiyek bû tevî kesek bi navê "Yûsif Muhemedî" jiyana hevpar pêk anîbû, piştî vê ku ji aliyê malbata hevjînê xwê ve dikeve ber lêdan û tund û tûjiyan, canê xwe ji dest dide.

28.2.1392 (18.5.2013): Jinek xelkê Bajarê Seqizê bi navê "Hesîbe Sa'êd, bi sedema teqîna Mînê li Çiyayê Wenewşe a ser bi wî bajarî, piyek xwe ji dest dide.

31.2.1392 (21.5.2013): "Roya Ne-

**Dom R:11**

www.civakiagiri.org

# Bi beşdariya hejmarek ji hunermendên Kurdistanê, yekemîn fistivala "Nêy lêdanê" li Bokanê birêve çû



Roja 11'ê Pûşperê yekemîn fistîvala "Nêy lêdanê" ji aliyê hejmarek ji torevan û hunermendên Bajarê Bokanê û bi beşdariya gellek mêhwanan li seranserê Kurdistanê, birêve çû.

Fistîval roja 12'ê Pûşperê bi dawî hat û piştre beşdarbûyên serkevtî di fistîvalê de, ji aliyê lêjneya nirxandinê ve bên xelatkirin.

# Buhar Husênî, Xelata fistîvala Edebî a "Keval" bidest xist



Buhar Husênî keça rehmetî Jîla Husênî û helbestvana rojhelatê kurdistanê, rojên 11 û 12'ê Pûşperê bi beşdariya xwe di vê fistîvalê de, karî ku di navbera 118 helbestan de, xelata yekemîn di beşa helbestan de bidest bîne.

Herweha helbestvanek din a Rojhelatê Kurdistanê bi navê Kemal Emînî, karî di beşa helbestan de xelata sêyemîn bi dest bixe.

Hewceyî basê ye ku di beşa çîrokan de jî, Emced Xulamî xelkê Rojhelatê Kurdistanê xelata duyemîn wergirt.

# 7 milyon zarokên Îranî, ji mafê xwendinê bêpar in



Rêxistina "UNSCO" di raporekê de ragehand ku ji ser asta cîhanê pitir ji 132 milyon zarok hene ku li mafê xwendinê bêpar in û piraniya wan jî di welatên cîhana sêyem û herêmên hejar de ne.


Rapor herweha vê yekê jî eşkere dike ku di Îranê de jî pitir ji 7 milyon zarok hene ku ji mafê xwendinê bêpar in û eva di demekê de ye ku heya niha nawendên peywendîdar bi vê mijarê di Komara Îslamî de tu caran amaran rast û dirust di vê derheqê de belav nekirine.

Lêkolînên UNSCO vê yekê derdixin ku kirîza aborî di Îranê de alîkare bona çûnesera hejmara zarokên bêpar ji xwendinê.

Doma R: 6'ê

ye, û herweha li encama vê êrîşê de xisarek cobran nekirî li xwezaya dilrevîn ya xelkê vê herêmê ketiye. Şerê Îran û Îraqê cuda ji vê ku di naweroka xwe de bê wate, û li kiryar de jî tu encamek jê çênebû, lê niah şûnwarên malwêranker li tewaya wan herêmên ku şer têde hebû diyar e, û rejîm kêmtirîn hewlê bop jinavbirina şûnwarên canî û xwezayî ên wan herêman nedaye.




**Dijminê bava nabin dostê lawa: Ev gotineke feodalî ye:**

Jibo dozên xwînî hatiye gotin. Mirovek dijmine bavekî be jixwe nabe dostê lawê wî jî. Kî dibe bila bibe ji dijminre law bav ap pismam yek e.

**Dijminê biaqil ji dostê bêaqil çêtir e:**

Dostê bêaqil mirov li teşqeleyan diqewimîne û sûdeya wî ji mirov re tune ye.Lê dijminê biaqil mirov dizane wê çibike ,herwiha dijminê biaqil li gor rê û rêbazên jiyanê tevdigere.

**Dijminê dijwar ji dostê xayin çêtir e:**

Ev jî wekî dijminê aqilmend ji dostê xayîn çêtir e. Lê hinekî cûdatî tê de heye.Wekî ku dijminê pir dijwar be mirov jî xwe li himber wî dijwar dike an mirov li gor wê yekê devdîrên xwe çêdike.

**Dijmin li lingê mirov dinêre, dost li serê mirov dinêre:**

Wekî dijmin fedî dike an çavê wî bar nabe ku li rûyê mirov binêre ji ber wê yekê her tim serê wan berjêr e û li sola mirov dinêre. Lê dost dikare bi hêsanî li çavê mirov binêre ji ber ku tu tiştekî ku fedî bike tune ye. Di dawiya gotinê de ji an berdewama vê gotinê jî ev e "divê sola mirov û kumê mirov nû be" ji ber ku dost û dijmin li van derê mirov dinêre.

www.avestakurd.org

# Şaristana Hersînê



A: Adil Muradî



Şaristana Hersînê di 45 km Başûrê Rojhelata Parêzgeha Kirmaşanê Helketiye û ji aliyê Başûr ve bi Şaristana Dolfa ya ser bi Parêzgeha Loristanê, ji aliyê Başûr ve bi Şaristana Sehnê, ji aliyê Rojava ve bi Şaristana Kirmaşanê û ji aliyê Rojhilat ve jî bi Nehawendê ve girêdayî ye.

Nawenda vê Şaristanê Bajarê Hersînê ye, û nifûsa wê li gorî amara sala 1385'an a Rojî 90452 kes e û herweha mesebê xelkê vî Bajarî jî Şîe ye.

Çiyayê herî bilind ê vê Şaristanê bi bilindahiya 2749 metroyan di Bexşa Bêsitûn û Şikevta herî kûr a Rojhilata Navîn bi kûrahiya 572 metroyan di vî bajarî de ye.

Sala 1949'an ji aliyê dîroknasê Amerîkayî "Pr. Karlê'on" ve, Şikevta naskirî bi "Şikarçiyan" ket ber lêkolînê û di encam de şûnwarên kevnar ên devreyên cur bi cur ên dîrokî tê de peyda bûn. Yek ji şûnwarên dîrokî ên herî girîng ku vedigere serdemê pêş dîrokê, di Şaristana Hersînê de, "Girê Genc Derê" anku "Çiya Xizîne" ye.

Ev şaristan ji du bexşên nawendî pêk tê. Şaristana Hersînê ku nawenda wê Bajarê Hersînê ye û Şaristana Bêsitûnê ku nawenda wê Bajarê Bêsitûnê ye.

**Şûnwarên dîrokî ên Hersînê**

"Tepêyê Genc Derê"(Çiya Xizîne), Ketîbeya Bêsitûn, Çalên Şems abad û çalên Îshaqwend, Peykera Hêrkûl, kelha Hersîn, kelha Dizber, kelha Sirmac, Ferataşê Bêsitûn, Ferataşê Hersîn, Hewza Sengî (Hewza Se'et), Taqa Sengî, Pêlekanên sengî, Textê Şirîn, Dîwarê Sasanî, Pira Xisro, Bînaya Sasanî û Sersitûnên Bêsitûnê.

**Serava Hersînê**

Di nav Bajarê Hersînê de û li berbiniya Çiyayê Şîrizê de seravek balkêş heye ku erdên cotkariyê ên Hersînê têr av dike.

---

## Doma R: 9ê

wrozî" keça Reza û xelkê Bajarê Îlamê, bi sedema hejarî û destengiyê dawî bi jiyana xwe anî.

**Heyva Cozerdanê: (21'ê Gulan heya 21'ê Hezîranê)**

1.3.1392 (22.5.2013): "Sefûra Se'îde" keça 10 salî xelkê Gundê Peswê ya ser bi Bajarê Pîranşarê, agir berda canê xwe û di yek ji nexweşxaneyên Bajarê Ûrmiyê de canê xwe ji dest da.

1.3.1392 (22.5.2013): "Fatime Nîsanî" keça temen 23 salî û xelkê Bajarê Xoyê, bi sedema bi zorî zewicandinê, agir berda canê xwe û di encam de canê xwe jidest da.

3.3.1392 (24.5.2013): "Befrîn Me'rûfî" ya temen 13 salî û xelkê Bajarê Bokanê, bi destê bavê xwe û bi derba lêdanê canê xwe ji dest da.

11.3.1392 (1.6.2013): Keçek ciwan bi navê "Rofiye Feyznijad" li taxa Se'diye a Bajarê Sinê, bi sedema hejarî û destengiyê dawî bi jiyana xwe anî. Heya niha çawaniya xwekuştina navbirî nediyar e.

12.3.1392 (2.6.2013): "Sozan Rehmanî" a temen 34 salî xelkê Gundê "Serhowiye" ya Jaweroyê, xwe daliqand û di encam de canê xwe ji dest da. Navbirî ji aliyê malbata xwe ve bi zorî hatibû zewicandin.

14.3.1392 (4.6.2013): "Mêhrî Berceste" temen 19 salî xelkê Gundê "Birahîmawa" ya ser bi Bajarê Bokanê, bi sedema arîşeyên malbatî xwe daliqand û dawî bi jiyana xwe anî.

16.3.1392 (6.6.2013): "Azer Tahêrabadî" rojnamenûsa xelkê Bajarê Kengawer a ser bi Parêzgeha Kirmaşanê, ji aliyê Îtilaata Sipaya Kirmaşanê ve bona lêpirsînê hat gazîkirin.

21.3.1392 (11.6.2013): Jinek ciwan bi navê "Soniya Kerîmiyan" Xelkê devera Deştebêl a ser bi Bajarê Şinoyê, bi sedema lêdana hevjîna xwe digel xwînrêjiya Mêjiyê berbirû bû û di encam de canê xwe ji dest da.

22.3.1392 (12.6.2013): "Sûdabe Qadirî" keça Cebar xelkê Bajarê Merîwanê, agir berda canê xwe û di encam de canê xwe ji dest da.

28.3.1392 (18.6.2013): Jinek bi navê "Besê Golnaz" akinciyê taxa Piştep a Bajarê Mihabadê, bi sedema arîşeyên malbatî agir berda leşê xwe û di encam de canê xwe ji dest da.

29.3.1392 (19.6.2013): Jinek bi navê "melek", dayîka sê keçan û xelkê Gundê "Dayesilêman", bi sedema arîşeyên malbatî xwe daliqand û dawî bi jiyana xwe anî.

# AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792

## Di nav Kurdan de Deşnê hejmara herî zêde ya LIKE'an heye



**Ecibandinên li ser Facebook û Twitterê yên hunermendan diyar dike ku hunermenda kurd Deşnê Murad herî zêde tê ecibandin.**

Pirraniya hunermendan wek hevwelatiyên normal xwediyên hesabên taybet in di Facebook û Twitterê de. Di nav hunermendên kurd de yên ku rûpelên wan ên taybet hene, Deşnê Murad xwediya zêdetirîn hejmara ecibandinan e di Facebookê de.

Rûpela Deşnê 479.666 caran hatiye ecibandin û piştî wê jî Perwaz Husên bi 230 hezar ecibandinan tê. Herçiqasî Perwaz Husên ku beşdarî Arab Idol bû û ev tenê sê meh in navê wê derketiye, lê roj bi roj hezkiriyên wê zêdetir dibin.

Li gor pisporê muzîkê Amanc Xazî, li hemû dinyayê medyaya civakî bandoreke mezin hem li ser hunermendan û hem jî li ser kesên normal dike: "Ew ecibandin nakevin çi qalibekî zanistî û hunerî. Ji berku ev li ser bingeha xweşiyeke demkî hatiye danîn û bi awayekî kûr şîroveya mijarê nake."

Di nav hunermendan de bi giştî ecibandinên hunermendên keç û ciwan zêdetir in. Amanc Xazî dibêje pirraniya wan ecibandinê ku ji rûpelên hunermendan re tên kirin, bêhtir yên wan ciwanan in ku her şevê bi vî awayî dema xwe derbas dikin, û her yekê nêrîneke wî heye."

Stranbêj Zana Cebelî ku rûpela wî tenê 119 kesan hatiye ecibandine di vî warî de wiha axivî: "Pirraniya hunermend û stranbêjan nikarin bi awayekî berdewam li ser Facebook û malperên civakî bin. Renge ew kesê ku rûpela hunermendekî ecibandibe guhdariya straneke wî jî nekiribe. Lewma ev yek mezinî û hezkirina stranbêjan kifş nake."

Rûpela Facebookê ya Çopî Fetah jî 137.579 caran, ya Eyûb Elî 121.256 caran û ya Behcet Yehya jî 102.323 caran hatiye ecibandin.

## Tabloyek Pîkaso bi 148 milyon dolarî hat firotin




Tabloyek Pablo Pîkaso bi 148 milyon doları hat firotin.

Tabloyek Pablo Pîkaso bi 148 milyon dolarî hat firotin û tablo li sala 1905 hatiye kêşandin û wêneya zarokekî Parîsî kişandiye ku zaf cara seredana Pîkaso kiriye.

Wênekêşê Îspanyayî Pablo Pîkaso yek ji wan hunermendan tê hesibandin ku çar tabloyên wî di nav buhatirîn tabloyên cîhanê de ne.

## "Amira" di 14 saliya xwe de dest bi karê hunermendiyê kiriye




Amîra Kazar hunermenda navdar ya şano û kîno a Firansê (bi firansî Amira Casar) 1 gulanê sala 1971'an di Londonê ji dayîk bûye.

Bavê Amîra xanimê, Kurd e, û dayîka wê Rûsî ye. Ji temenê 14 saliya xwe de dest bi karê hunermendiyê kiriye û li gellek fîlmên Firansî de bi dehan rolên sereke lîstine.